

Li Kobanê hilberîn û çandiniya bi destê jinê



Navenda Nûçeyan
Li taxa Kaniya Kurdan a Kobanê, jin hem bistanan diçin û hem jî karê lawirvaniyê dikin. Ew bi wê yekê debara jiyana xwe dikin.

Li Kobanê, bi taybetî li taxa Kaniya Kurdan ku bi xweza û çandiniya xwe tê naskirin, dayik bistanên salane amade dikin. Di werza Havînê de bistanên havînê, firingî, bacanê reş, îsot, kundir, xiyar, xitîyan, fasûlî û hwd. diçin. Zivistanê jî tivir, pîvaz, sir, silk, sebanix, bexdûnis û reşad tê çandin. Li Kobanê bêhtir çandiniya bistanan û bi taybetî zebzeyan ji Kaniya Kurdan ew berhemên derxistin. Bi taybetî jî berhemên çandiniyê yên dayikan e. Li wir hem dayik bistanan diçin û hem jî lawiran xwedî dikin. Lawirên weke pez û çêlek lê tê xwedîkirin û mast, penêr û gewrahî beşeke mezin dide bajêr.

Bi kamîreya Ronaz Silêman



‘Cara yekem şanoya monodrama li Rojava tê pêşandan’

Hêvî Keleş/ Qamişlo

Lîstikvana Şanoyê Hemalîn Ferman anî ziman ku li Rojava ev yekem car e ku şano bi awayê monodramatik tê pêşandan û wiha got: “Pe-yama şanoyên monodrama dewlemend bû.”



e ku hemû xebatkarên şano werin gel hev û karê hev bibinin û sûdeyê ji hev bigirin.”

Monodrama asta listikvanan dide xuya kirin

Hemalîn Ferman axatîna xwe wiha qedand û got: “Monodrama cureyek ji cureyên şanoyê yê zehmet in û tenê listikvanek bi gelek rolan radibe, herwiha monodrama karînen listikvanan

dide xuya kirin, kesê wê şewazê bike divê xebateke wî ya dirêj di warê hunera şanoyê de hebe. Tê xwestin ku piştigirtina monodrameyê bê kirin di riya lidarxistina festivalên wê û bêhtir listikvanên şanoyê xwe xurt bikin da ku karibin monodramê bilîzin. Şanoya em pê beşdar bûn jî, behsa keçekê dike bi navê Henîn û navê şanoyê jî ew bû Henîn ji nivîsa Abbas Elhawayîk û derhêneriya Ebdilrehman Ibrahîm, herwiha Şano jî behsa çiroka keçeke biçûk dike ku ew dane zewcandin bi zilamekî xiyar ji wê mezin ango dibe qurbanîya zewac û dana keçên biçûk, zewaca temenbiçûk. Û min xelata komîteya nixirandinê ya baştirîn listikvaniya cîyawaz di festivalê de sitand.”

Di Festivala Şehîd Yekta Herkol a 7’emîn a şanoyê de ku li Qamişloyê hat lidarxistin, cara yekem şanoyên monodrama hatin pêşkêşkirin. Ev berhemên monodramatik festival dewlemendtir kir, herwiha rengê xweşik da festivalê. Derbarê pêşkêşkirina şanoya monodrama cara yekemîn li Rojava listikvana Şanoyê Hemalîn Ferman ji Rojnameya me re axivî.

Festival bi kombûna hemû şanogeran girîngtir dibe

Lîstikvana Şanoyê Hemalîn Ferman da zanîn ku ev 10 sal in ew li gel koma şano a li bajarê Qamişlo xebatên şanogeriye dike û wiha got: “Em beşdarî 7’emîn festivala şehîd Yekta Herkol bûn, îsal jî di festivalê de bi rengê şanoyên monodrama şano hatin pêşandan. Di festivala îsal de cudahî hebû, cudahî ew bû ku komên ji dervayê herêmê hebûn, me li karê wan temaşe kir, mîna yê Başûr û Rohilatê Kurdistanê. Ji xwe jî girîngiya festivalê ew



FERHENG A BIWÊJAN

Deziya ziwa ma di guhê wî de:
- Zerer dît; rezil bû; perîşan bû; tişteke bi dest neket; hat xapandin; keda wî tev ket avê.
Em beranên ber kêrê ne:
- Yê ku her tim xwe feda dikin em in; yê ku her tim zerere dibînin em in.
Erzankiro hebandiro:
- Yê tiştên erzan bikire wê zerere bibîne.
Ew mêht:
- Mal û dirav pir jê standin.
Ew doht:
- Bi heman wateyê.
Ha kulî xwar, ha Qulî xwar:
- Di encamê de her zerere e.
Hem ji karê bû, hem ji yarê bû:
- Dema yek ji du aliyan ve zerere dibîne hingê tê gotin.
Hem ji kerê bû, hem ji Perê bû:
- Bi heman wateyê.
Ji bo gurzek giya, lodekê

dişewitine:
- Ji bo tişteki piçûk zerereke mezin dide.
- Ji bo naneke arvanekî xirab dike.
- Bi heman wateyê.
Ji dêrê jî bû, ji mizgeftê jî:
- Di her du aliyan de jî zerere dît.
Ji kerê jî bû ji Perê jî:
- Ji du aliyan ve zerere dît.
Ji pezê pîr ma kavirê kulek/ji pezê pîr ma kavirê kur:
- Pîr zerere dît; ji mal û serweta wî tişteke pîr hindik ma.
Ji taştîya robarîyan jî bû û negihat ya kelehiyan jî:
- Heta xwest tişteki ji xwe re bi dest bixe ji tiştê din jî bû; ji du aliyan ve zerere dît.
Keda me ket avê/keda me li ber avê çû:
- Bi heman wateyê.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

Qereçox, dijminên Şoreşa Rojava eşkere kir

Beriye 8 salan, di 25’ê Nîsana 2017’an de dewleta Tirk a dagirker, bi dehên balafiran, Çiyayê Qereçoxê bombebaran kiribû. Di encama vê êrişê de 20 hevrêyên me gihîştibûn şehadetê. Hemwext, dewleta dagirker çiyayê Şingalê jî bombaran kiribû. R-3

Bedran Çiya Kurd: Hevpeymanan Helebê, deriyê vegera Efrînê ye

Şewirmendê Rêveberiya Xweseriya Demokratîk Bedran Çiya Kurd bibirxişt ku hevpeymanan li Helebê hatibû îmzekirin ketiye meriyetê û wiha got: “Ev hevpeyman deriyê vegera koçberên Efrînê vekir.” R-4

‘Armanca me yekbûyîna jinên her çar parçeyên Kurdistanê ye’

Berpirsyara Komîteya Têkiliyan a Kongra Star Emîna Osê diyar kir ku armanca konfiransa jinên Rojava ya ku di 23’ê Adarê de hate lidarxistin ew e ku jinên çar parçeyên Kurdistanê bigihînin hev, li ser vê bingehê şandeya jinên Rojava derbasî Başûrê Kurdistanê bû û gelek hevdîtin pêk anî. R-2

‘Heya ku axîverên ziman hebin wê ziman zindî be’

Rêveberiya Komîteya Ziman a SZK’ê ya Rojava Niçîrvan Ebdulezîz da zanîn ku di zimanê kurdî de piştî şoreşa Rojava guhertinek cewherî çêbûye û got, “Em behsa zimanekî dikin ku berî şoreşê qedexe bû, lê niha bûye zimanê perwerdehiyê.” R-7

MÎRATEYA MÎR BEDIRXAN GIHIŞT EGÎD Û JIYANAN

Rojnamegeriya kurdî cara yekem di 22’yê Nîsana 1898’an de li Qahîreyê bi rojnameya Kurdistanê, derket ser dika dîrokê. Bi derketina wê re bîr û bawerî, zanîn û çanda rewşenbîrî ya nûjen ya li ser bingeha neteweyî deşt pê kir. Di pêvajoya 127 salan de rojnamegeriya kurdî raştî zext û êrişan hat û berdêlên giran hatin dayîn. Li ser xeta Bedirxan, Çapemeniya Azad têkoşîneke bêhemap da û dide meşandin. Di vê oxirê de pêşengên mîna Mûsa Anter, Gurbetelli Ersoz, Ayfer, Nûjiyan, Rohat, Seyîd, Kemal, Nazim Egîd, Jiyan û gelek hevrêyên wan, bi wêrekî û baweriyek mezin meşa heqîqetê domandin. R-6



‘Vegera koçberan wê bidome û divê Rêxistinên Navdewletî bibin destek’

Hevserokê Ofîsa Karûbarên Penaber û Koçberan Şêxmûs Ehmed diyar kir ku vegerandina koçberan wê berdewam bike û got, “Divê Rêxistinên Navdewletî bibin destek.” R-5

‘Armanca me yekbûyîna jinên her çar parçeyên Kurdistanê ye’

Berpirsyara Komîteya Têkiliyan a Kongra Star Emîna Osê diyar kir ku armanca konfiransa jinên Rojava ya ku di 23'ê Adarê de hate lidarxistin ew e ku jinên çar parçeyên Kurdistanê bigihînin hev, li ser vê bingehê şandeya jinên Rojava derbasî Başûrê Kurdistanê bû û gelek hevditin pêk anî.

Dîlan Mulhim/Qamişlo

Bi pêşketin û geşedanên ku di Bakur û Rohhilatê Sûriyê de çêdibin, bi taybet di demên dawiyê de xebatên gelek girîng di aliyê jin de pêk hatin. Yek ji van xebatên dîplomasî jî derbasbûna şandeya Kongira Star ji Başûrê Kurdistanê re ye. Girêdayî vê mijarê berpirsyara Komîteya Têkiliyan a Kongra Star Emîna Osê ji Rojnameya me re axivî.



derbasî Başûrê Kurdistanê bû û gelek hevditin bi jinên Bakur, Başûr û Rohhilat re çêkirin. Gotûbêj li ser haziriyên kongira netewî ya jinan hatin kirin û nîqaşên ku hatine kirin li ser cih, ziman, naverok û pilanekê pêş ku wê were dayîn bû. Armanca hevditînan ku tene çêkirin bi hemû rêxistinên jinan ên Bakur, Başûr û Rohhilatê Kurdistanê re, bi mebesta naskirina asta amedekariya wan ji bona damezrandina kongereyekê netewî Kurdî. Angu di serî de gotûbêj li ser amedekariyên kongireya netewî bû û du rojan civin dirêj kir û nêrînin cur be cur hatin girtin. Di heman demê de li ser naveroka kongirê nîqaş hatin kirin. Heta îro jî hîn gotûbêj bi rêxistinên jinan yê siyasî û civakî re berdewam dikin. Gava piştî wê jî, wê komîteya amedekar li ser

bingehê helwes û nîzaktiyên heya biryare dîrok û cih bide.”

‘Xebatên kongira netewî berdewam dikin’

Emîna Osê anî ser ziman ku xebatên kongira netewî ya jin bi rêxistinên jinan yê siyasî û civakî re wê berdewam bike û wiha pê de çû: “Kar û xebatên kongira jin beşê ku komîteya amedekar pê rabûye wê bi rêxistinên jinan yê siyasî û civakî re berdewam bike, herwiha nêrîninên jinan hatine girtin di derbarê cih, hejmar û naverokê de. Piştîre em dê nêrînen xwe ji komîteya giştî re bêjin û li ser bingehê rewşa her parçeyekî zeman û cihê guncaw diyar bikin, pêşniyara konfiransa me ew bû ku kongira jinên kurd were çêkirin,

Ji Pênûsa Jin

Destdirêji berhema cinsiyetparêzî ye

Nehir Pale

Destdirêjiya li hemerî jinê gihiştîye asta ku mîr zêk jê bigre û sistemen dagirker ji weke çekekî li hemerî jin û civakan didin bikar anin. Gelek teşeyên destdirêjiyê hene û ev yek ne tenê li ser jinê tê meşandin, bi heman çekê êrişî civakan dikin. Jin tenê weke bermalî dîtî, ji siyasê durrxistin, bê aqil dîtî, heslêwer şirove kirin, mîr ji jin re çareserî dîtî, şerê taybet bi hemû rêbazan li ser jinê dayîne meşandin, ji bo berjewendiyên xwe jin dayîna bikar anin, fizika jinê kirine mijara bazarê, cûdayî xîştina navbera jin û mîr, tundi li ser dayînan meşandin, her tişt li jinê qedexa kirin û ew ji her tiştî bêpar hiştin, ev hemû rêbazên cinsiyetparêzîyê ne û navê wê destdirêji ye.

Rêber APO di parêznameya 4'êmin a Rohhilata Navîn de di peregrafekê bi sernavê “Cinsiyetparêzî û Dewleta Netewî” çawa destdirêji dike bin xizmeta netew dewletê de analiz dike û wiha dibêje: “Desthilatdariya di forma dewleta netewê de hatiye mezinkirin, heza xwe bi girani ji vî cinsiyetparêziyê digire. Cinsiyetparêzî fonksiyoneke coşê ya biyolojîk nîne; îdeolojîyê e ku herî kêm bi qasî milletgiriyê re li desthilatdarî û dewleta netewê vedike”.

Her wiha Rêbertî têkildarî heman mijarê balê dikêşîne ser hinek gotinên di pirtûkên pîroz de hatine nivîsandin an jî di mejiyê civakê de hatiye candin. Mînak di pirtûkên pîroz de hatiye nivîsandin “Jin erdên we ne, hûn çawa dixwazin, dikarin wisa bîajon, Jin mîna sazêkê ye diê we çawa dixwaze hûn wisa dikarin lê bidin, çu ji ser serê wê, zarok ji ji malzaroka wê kê nêkin” ev gotin hemû îfadeya destdirêjiyê dikin. Civaka cinsiyetparêzî li ser vî zihniyetê nêzî jinê dibe. Ji ber vî yekê jina dikeve nava xebatên rêxistinî û siyasî de li ser sistêmê xeter tê dîtî. Jina siyasmedar çek ranake û kesekî nakujê bi rêbazên aştiyane xwedî li hebûna xwe derdikeve û daxwaza dawî li anîna cinsiyetparêziyê dikin. Jin hevlî didin ku bi rêbazên siyasî û qanûnî pîrgirêka cinsiyetparêziyê were çareser kirin. Sistemen dagirker vî yekê sêc dibînin û bi çavêkî djiimayî li jinê dinêrin. Destpê dikin êrişî jinan dikin, wan digrin, di îşkenceyê de destdirêji fizîka wan dikin, hukmê salên dirêj di zindanê de mayîn li wan dibirin an jî hukmê darvekirinê didin wan. Zihniyeta ku dibe sedemê berdewamkirina destdirêjiyê cinsiyetparêzî ye. Li Afxaniştanê kiriyarên tevgera Taliban li ser jinê, politîka dewleta Îranê li hemerî jinê didê meşandin, êrişkirina dewleta Tirk a li ser jinan, înkarkirina hikûmeta Şamê ya hebûna jinê û li Efrîn, Girê Spî û Serê Kaniyê destdirêjiya jin hîna berdewam dikin. Hemû ziyên qanûnî û olî çavên xwe ji vî yekê re digrin û stûd ji vî yekê vedigirin. Heyamî ji hêzên dagirker tê hewlî didê ku cinsiyetparêzî û destdirêjiyê têxe bin xizmeta xwe, têkoşîna jin bê wate bikin. Ji ber vî yekê diroka jin nehatiye bilêv kirin, desthilatdaran dirok nivîsandine û hebûna jinê bi temamî înkâr kirine. Têkoşîn û berxwedana jin nayê ziman û eger navê hinek jinên mîna Zenûbiya were dayîn jî, li gorî berjewendiyên desthilatdaran agahî li ser wan didin. Diroka jin berevajî kirin, ew destdirêjiya herî mezin e.

‘Heya ku axîverên ziman hebin wê ziman zindî be’

Rêveberiya Komîteya Ziman a SZK'ê ya Rojava Niçirvan Ebdulezîz da zanîn ku di zimanê kurdî de piştî şoreşa Rojava guhertinek cewherî çêbûye û got, “Em behsa zimanekî dikin ku berî şoreşê qedexa bû, lê niha bûye zimanê perwerdehiyê.”

Stêrk Mihemed/Qamişlo

Ziman hîmê bingehîn ê civakê ye, ziman yekîneya bingehîn a mirovan e. Netewê bê ziman, neteweke bê dil e. Çand û zimanê kurdî yek ji kevintirîn û resantirîn zimanên herêma ye, tevî hemû piştaftin û qirkirinê zimanê kurdî xwe domandiye. Ji bo her mirovekî çeperên herî girîng pêşxistina ziman e û xwedî derketina li zimanê dayîkê ye. Ji bo kurdan jî berxwedan û îdolojîya herî girîng ew e ku zimanê kurdî fêr bibin û bipêş bixin. Derbarê girîngî û rewşa zimanê kurdî de, Rêveberiya Komîteya Zimanî ya SZK'ê, Niçirvan Ebdulezîz ji rojnameya me re axivî.

‘Rewşa zimanê kurdî berî şoreşê û piştî şoreşê’

Nêçirvan Ebdillezîz destnîşan kir ku piştî şoreşa Rojava guhertinek cewherî di zimanê kurdî de çêbûye û wiha got: “Em behsa zimanekî dikin ku berî şoreşê qedexa bû, nedibû ku were



fêrkirin û perwerdekirin, lê niha bûye zimanê rêveberiyekê ku li seranserê dibistan, peymangêh û zanîngehan perwerde bi vî zimanî tê dayîn, bi hezaran memosteyên zimanê kurdî çêbûne ku bi zimanê kurdî zanistê didin xwendekaran, bi sedan nivîskarên kurdî hene û bi dehan kenalên tilfizyonê ku weşana xwe bi zimanê kurdî dikin, hene. Herwiha heya ku axîverên ziman hene ew ziman xwe nû dîke û zindî dimîne, ewqas salin em li ser vî zimanî kar dikin, em çiqas li ser ziman kar bikin ewqas ew pêş dikeve. Zimanê kurdî di rîya pêşketinê de yekî rewşa zimanê kurdî jî demên

berê gelekî baştir e.”

‘Zimanê kurdî neyê kesekî ye ev zimanê gelekî ye’

Ebdulezîz diyar kir ku ziman kurdî neyê kesekî ye ev ziman yê giştî gelê kurd e û wiha domand: “Divê her kurdek xwe berpirsyar li ber vî zimanê bibîne, ziman zengîniyêke ji bo vî dinyayê ye, divê her kes erka parastina ziman hilde ser milên xwe, ev ziman siparteyêke ku nişên berê dane me û divê em jî bidin nişê pêşerojê, pêwîst e her malbetek zarokên xwe fêrî zimanê dayîkê bike û ew bi xwe xwedî li vî zimanî

derkevin. Şerê taybet gelekî li dijî zimanê meşandin, divê em weke civak, sazî û dezgehên li hember vî yekê bisekinin. Bi hezaran ziman hatine helandin lê zimanê kurdî xwe parastîye û ji bo bidome divê em yek bin, erka parastina ziman li ser milê hemûya ye bi taybet kesên ku çûne derwarî welat, dive xwedî li zimanê xwe derkevin û zarokên xwe fêrî zimanê kurdî bikin û her tim zimanê xwe bide pêş.”



heman demê de cil û bergên xwe yê kurdî yê resen ji bir neke.”

‘Xwedî li çand û zimanê xwe derkevin’

Rêveberiya Komîteya Zimanî ya SZK'ê, Nêçirvan Ebdulezîz di dawîya axaftina xwe de banga li tevahî civak û xwedekaran kir û wiha got: “Banga min ji bo nişê pêşerojê ziman di destê we de ye, xwedî li çand û zimanê xwe derkevin, dive em zimanê bindest bikin, zimanê wan qedexa dike, ji ber ku dizane her tişt bi ziman ve girêdayî ye, dema ku kesek ji ziman hat qutkirin ji çandê jî tê qutkirin û dema ku ji çandê qutbû dibe miroveke bê çand, wê demê hêsane ku çandêke din bigire ew mirov dibe penaleke vala. Dive mirov xwedî li ziman û çanda xwe derkeve û di

Bi parastina alavên kevnar, dîrok û çand tê parastin

Aryen Hesen/Qamişlo

Parastina kevneşopîyan tê wateya parastina ziman, çand û hunerê. Ji bo domandina kevneşopîyan û zanebûna dîrokê welatîyê bi nava Remezan Ebd El Rehman Derwîş e li taxa Hilêliyê ya bajarê Qamişlo cihekî ji bona parastin û pêşkêşkirina amûrên kevnar vekirî ye.

Kevneşopî resenî, diroka mirovahiyê diyar dike. Parastina alavên kevnar tê wateya parastina dîrok, kelepor û hunerê. Kevneşopî di jiyana mirovan de gelekî girînge, ji ber ku etîk û estetîka civakê diyar dike. Ev raman, kevneşopî û dîrok bermahiye gelên kevnar ji me re diyar dike. Ji ber vî yekê divê em xwedî lê derkevin û tu carî em kevneşopîyên xwe ji bir nekin. Derbarê parastina kevneşopîyan de welatîyê bi navê Remezan Derwîş ji rojnameya me re axivî.

‘Armanca me domandina kevneşopîyê ye’

Remezan Derwîş destnîşan kir ku armanca me ji bo vekirina vî cihekê ew e, ku em xwedî li diroka xwe derkevin û wiha got: “Ez di biçûkaniya xwe de di nava baxçan de kar dikin, dema ku min mîrate û amûrên kevnar didîtin, bala min gelekî dikişandin. Di mala mede gelek amûrên kevnar hebûn û min xwest ku ez bi vekirina vî cihî diroka xwe ji bir nekin, zarok, çand û kevneşopîyên xwe biza-nibin. Nişê nû kevneşopîya bav û kalan nasnakin. Ji bo vî dîrokê nasbikin û bidomînin min xwest ez vî cihî vebikim.”

‘Kevneşopî tê wateya ku em diroka xwe ji birnekin û biparêzin’

Derwîş diyar kir ku kevneşopî tê wateya ku em diroka xwe ji birnekin û wiha domand: “Nişê niha ji kevneşopîyê dîrin, me xwest ku



bi wan bidin nasîn û wateya wê ya girîng ji wan re şirove bikin. Em ne li ser çanda şopandina her tiştî bi rîya intirnetê mezin bûne, berdava jî vî yekê, em li ser çanda civakbûn û parastina kevneşopîyan rabûne. Gelek kesan serdana me dikirin dema ku ev tişt didîtin, gelekî kêfxweş dibûn û dipirsîn ew çine, me ji wan re dida xuyakirin. Alavên herî kevnar herî weke destar û sifirî li gel me hene û emê her tim wan biparêzin û wateya wan wê her dem girîng be ji bona me.”

‘Me gelek astengî dîtî heya ku me ev alav komkirin’

Remezan da zanîn ku me gelek astengî dîtî heya ku me ev alav



Parastina mîrateyên kevnar; parastina çand û dîrokê ye

Xwediyê cihên parastina mîrateyan Remezan Derwîş di dawîya axaftina xwe de wiha got: “Ev alav û kevneşopîyan bala gelek kesan û civakê kişand, dema ku kesek dihat serdana me bi dîtina tiştên li ber wendabûnê bûn, dîtina wan zehmet bû û me ew peyda kirin û em dixwazin wan biparêzin û ji bir nekin.”

Kilînkên Gerok ji bo jinan

Lîloz Hisên/Qamişlo

Rêvebera tîma kilînka gerok ya girêdayî Heyva Sor a Kurd Menal Hisên diyar kir ku ew hevî dikin ku di pêşerojê de navendên xwe-cih yê girêdayî kilînkên gerok ava bikin.



di dema ducaniyê de û piştî wê jî. Derbarê vî mijarê rêvebera tîma kilînka gerok ya girêdayî Heyva Sor a Kurd Menal Hisên ji rojnameya me re axivî. Menal Hisên diyar kir ku 21 gundên girêdayî Tirbespiyê hatine şopandin û wiha berdewam kir: “Xizmeta ku di kilînkên gerok de tê pêşkêşkirin, ew lînerîna bişîki ya ji bo jinên ducanî, yê şîr didin û çawa ev jin xwe biparêze berî û piştî zayînê, rêxistinîna malbatê û xizmetên taybetî ji bo jinê pêşkêş dike.” Menal Hisên wiha lê zêde kir: “Di



şopandina gundan de semîner weke piştigiriya derûnî û hişyarkirina teunduristiyê tê dayîn. Xebatkarên ku tê de kar dikin; Ambolansa taybet heye, bişîşkeke taybet a jinan û qabîleyeke qanûnî, piştigiriya derûnî, hişyarkirina tenduristî û parastinê, herwiha ajokareke jin ya ambolansê û paramedik jî heye.” Menal Hisên destnîşan kir ku her meh nêzî 500 jin derman û muayene dikin û wiha berdewam

kir: “Rewşên ku tîna lêhûrandin weke penceşîrê ew tîna şandin ji bo Nexweşxaneyê penceşîrê ya girêdayî Heyva Sor a kurd, ji ber ku mekîneyên lîko, derzî û mamograf lê heye.” Menal Hisên tekez kir ku heta niha tu pîrgirêk an zehmetî li hember wan nehatine derketin û axaftina xwase wiha qedand: “Em bi hevî ne ku di pêşerojê de navendên xwe-cih yê girêdayî projeyên kilînkên gerok bêne avakirin.”

Dilyar Cizirî: Mîrateya Mîr Bedirxan gehište Egîd û Jîyanan

Hevserokê Yêkîtiya Ragihandina Azad Dilyar Cizirî da xuyakirin ku di asta rojnamegeriya Kurdî de gavên girîng hatin avêtin û wiha got: “Rojnamegeriya Kurdî Mîr Bedirxanan dest pê kir, bi saya têkoşîna Jiyan, Gulîstan, Nazim û Ezîzan ragihandina Kurdî û azad xwe gihande astêkê bilind.”

Argêş Vîyan/Qamişlo

Di derbarê 22 Nisanê roja Rojnamegeriya Kurdî de, Hevserokê YRA Dilyar Cizirî pirsên rojnameya me bersivandin û naveroka hevpeyvînê wiha bû:

- Weke tê zanîn her sal 22’ê Nisanê roja Rojnamegeriya Kurdî tê pîrozkirin, di warê Ragihandina Azad de, hûn pêşveçûnên heya niha hatin bidestxistin çawa dinirxînin?

Berî em behsa mijarê bikin, pêwîst e em di şexsê 31 şehîdên ragihandina Rojavayê Kurdistanê yên ji şoreşa 19’ê Tîrmehê û vir ve şehîd bûne, bi rêzdarî wan bibîr binin. Di destpêkê de em behsa girîngiya roja rojnamegeriya kurdî bikin, raste dibe hin tenê wekî salvegera 127’an a destpêka Rojnameya Kurdistan ku ji aliyê Mîr Miqdet Bedirxan ve hate destpêkirin, pênase bikin, Ema di rewşa piştî sala 1898’an û heta niha an ku di van 127 salan de ragihandina kurdî di gelek qonaxan re derbas bû. Bi taybet piştî peymanê di encamê de welatê me hate parçekirin, siyasetên qirkirina çandî, siyasî û civakî ji aliyê desthilदारên Kurdistanê ve li ser gelê kurd hate ferzkirin. Di encama vê siyasetê de ragihandina kurdî ku malbata Berzanî xwestin pêş bixin, bi dawî bû di salên 60’iyî û heta salên 80’yi rojnamevaniya kurdî di asta partiyên siyasî de sindordar ma. Her parçeyekî Kurdistanê xwedî teybetmendiyek bû. Li hin cihan xebatên kovar û radyo hebûn. Li hin deveran bi her rêbazan rê ne dihat dayîn. Li Rojavayê Kurdistanê



û bi taybet piştî avabûna yekem partiya siyasî û parçebûnên çêbûn, ragihandina kurdî di asta kovarên partiyan de sínordar man. Ew jî pir bi zehmetî dihat çapkirin û gelek caran derfeta çapê jî tune bû. Di salên 80’yi û bi destpêkirina tevgera Azadiya Kurdistanê êdî xebatên ragihandina kurdî jî bi firehbûna şoreşê re ronî dît. Bi Serxwebûn destpê kir. Paşê Kovara Berxwedan û gelek sazî û dezgehên din hatin vekirin. Êdî ragihandina kurdî dest bi pêngaveke nû kir. Her çendî kovar zêde bûn Ev rewş heta salên 90’yi jî di asta nivîskî de sínordar ma. Bi destpêkirina hebûna yekem televizyona ezmanî Med Tv re ragihandina kurdî li her çar parçeyên Kurdistanê gaweke nû û pêngaweke rojêke nû ya roja rojnamegeriya kurdî destpê kir. Vekirina yekem kenala ezmanî bandoreke mezin li ragihandina kurdî li her çar parçeyên Kurdistanê kir. Em ê di vir de behsa Rojavayê Kurdistanê bikin. Êdî bernamevanî pêşket, nûçegihanî û her wekî din xebatê veşarî hate meşandin. Rêjîma Baas bi hemû hêza xwe xwest asteng bike. Hejmarek xebatkarên ragihandinê hatin girtin û demek ne kêm di girtigehan de man. Rastî eşkence û zordariyê jî hatin. Lê xebat dibe salek ji saleke din cûdatir bû, lê xebat her dewam kir. Rewş di navberxwedaneke mezin de heta destpêka serhildanên gel ên

Sûriyayê dewam kir. Bi destpêka şoreşê xebatên ragihandina kurdî pêş ket û gav bi gav sazî hatin vekirin. Zemîna ajansa Hawar li ajansa ANF’ê destpê kir. Di sala 2011’an de Rojnameya Ronahî wekî yekem saziya fermî ya şoreşa Rojavayê Kurdistanê dest bi weşanê kir. Paşê Ronahî tv, ajansa Hawar (ANHA), Radyoya Cûdî û paşê gelek sazî û dezgehên çapemaniyê dest bi weşanê kirin. Her wiha gelek sazî û dezgehên ragihandinê Parçeyên din ên Kurdistanê û welatên din li vir hatine vekirin. Di asta niha nêzî 100 saziyên ragihandinê li vir hatin fermîkirin û dest bi kar û xebatên xwe kirin. Di van de zêdeyî 1800 rojnamevan û karmend dixebatîn. Beşek di sazî û dezgehên navdewletî de kar dikin. Di nav de saziyên ragihandinê yên bi erebî û suriyanî jî weşan dikin. her wiha gelek saziyên xweser ên jinan weşana taybet dikin. Yek ragihadina kurdî ji gelê suryanî û ereb re jî pêşengî kir. Bê guman ev gavên em behsê din ne bê berdêl hatine, di xebata çend salan de heta niha 31 hevalên me yên rojnamevan canê xwe feda kirine. Bi vê boneyê em careke din wan bi rêzdarî û minetdariyeke mezin bi bîr tinin.

-Heya çi astê Ragihandina Azad xwe kir cihanî, hûnê guhertin û veguhertinê çawa bidin avakirin?

Tevî zehmetî û kêmderfetiyan û li cihêkî wekî Sûriyê ku berê xebatên ragihandinê bi dewletê sínordar bû. Îro gavên pir mezin hatine avêtin. Ragihandina Azad li dijî navendê şerê taybet xetê bi hêz a pa-

rastina rewa ava kiriye. Êdî gelê kurd û gelên din, heta dijminên gelê kurd ragihandina azad wekî çavkanî nîşan didin. Her çendî dibe ragihandina azad li gorî pêşketinên têne jiyankirin hinekî paş de mabe, lê gavên pir mezin hatine avêtin. Ji niha û şûn ve pêwistî pê heye, ev di warê pişeyî û dabeşiyê de werin pêşxistin. Xebatên têne meşandin û zanîngeha Rojava û zanîngehên din wê karibin di avakirina xebatkarên ragihandinê de gavên mezin biavêjin. Ji xwe li kêleka wê jî hin akademî wekî Akademiya Şehîd Faiyîq roleke wan a serke di avakirin û pêşxistina xebatkarên ragihandinê de heye. Ragihandina azad li Rojavayê Kurdistanê di piratîka salên şoreşê de gavên mezin û dîrokî avêtin. Li kêleka kar û xebatê perwedekirin û avakirina insanan ne tiştekî hêsan bû. Ev hata niha pêkan bû.

- Ragihandina kurdî di milê pişeyî, fikrî û birdozî de pêwîst e pêşkêtin bide avakirin. Li ser vê bingehê mirov çawa nêzi rojnamegeriyê bibe?

Em dinerin niha gavên siyasî li herêmê tên avêtin, ji lewma di demên pêş de pêwistî bi pêşxistina pişeyî de heye. min beriya niha jî behsa zanîngeh Rojava û zanîngehên din kir. Divê di wir de beşên taybet û xebatên psporî werin pêşxistin. Akademiyên heyî jî lazima hîn zêdetir werin aktîfkirin. Di heman demê de kesên di şertên şoreşê de beşdarî nava xebatên ragihandinê bûn, gerek di pêşxistina kesayeta wan de jî gavên zanistî werin avêtin. Piştî serhildanên gel li Sûriyê di sala 2011’an de zêdeyî 760 kesî canê xwe ji dest dane. Di nava wan de 31 hevalên me yên rojnamevan ên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, li kêleka wan Şehîd Gulîstan Tara û Ezîz Köyluoglu li Başûrê Kurdistanê bi êrişên balafirên dewleta Tirk şehîd bûn. Em careke din wan bi rêzdarî bi minetdarî bibîr tînin, ew in ên riya me ronî kirin û hiştin em bighêjin vê rojê. Di kesayeta wan de em hemû şehîdên azadiyê bibîr tînin. Em ê her û her şopdarên riya wan binin û heta dawiyê jî bo pêkanîna xeyalên Nazim, Çihan, Egêd, Ezîz, Seyîd û hemû şehîdan tekoşîna xwe hîn xurtir dewam bikin.

<div>Xwenasîn</div>
 <div>Civaka Ekolojîk û Demokratîk</div>
Rohat Bulut
<div>Nêzîkatiya mirovan a ku di civak û xwezayê de her tiştî ji xwe re rewa dîtin ne rast e û divê bi lezgîni dawî li vê ferasetê bê. Pêwîste saziyên rêxistinî yên civakî yên demokratîk û rêveberiyên demokratîk ên civakî jî bo pêseroja civaka ekolojîk û demokratîk her tim li ser kar û xabatan be. Beriya her tiştî jî pêwîste ku rêveberî, saziyên civakî yên demokratîk di warê hişmendî û ferasetê de têgihîştîneke civaka ekolojîk û demokratîk ava bike. Bi taybetî jî di asta neteweyî, zayendî, komî û kesayetî de pêwîstî bi guherîne heye. Her wiha yek ji erkên sereke ji ew e ku bi derbaskirina cudakariya zayendiparêz, nêzikatî û kevnepoşiyên paşverû û newekhev ên di vî varî de şert û mercên pêşketina mirovên azadixwaz ava bikin.</div>
Bi taybetî jî pêwîste em li ser nakokiyên mirovan ên bi hev re û her wiha tekîliya mirovan a bi xwezayê re rawesînin. Derbaskirina nakokiya mirov-mirov û mirov-xwezaya ku ji ber mantiqa pêşketina şarişaniyên çinayeti pêk tê, bi pêşxistina civaka demokratîk-ekolojîk pêkan e. Derbaskirina hişmendiya neynî ya li ser xwezaya mirovan û di xwezayê de dibe sedema talankirin, wêrankirin û qeyrana ekolojîk bi vegera xwezaya civakî û paradîgmayêke nû gengaz e. Lêkolîn û vekoînen li ser ekolojîyê di pêkhatina mirovê demokratîk-ekolojîk de xwedî girîngiyeke bingehine û pêwîstî pê heye ku di asta hişmendî de guherîn pêk bê.
Perspektîfa ekolojîk ji nû ve pênakirina tekîliya mirov-xweza û her wiha tekîliya mirov bi mirov re ye. Ev pênase derbaskirina vîrsiyonên egocentrizmê (Xwe navendî) yên wekî biyonavendî, antropocentrizm (mirov navendî) û ekonavendparêziyê ye û senteza zihniyeta civaka xwezayî bi nirxên hemdem re ye. Encax bi vê perspektîfa ekolojîk dikare pêşî li zîhnîyeta ku mirov û xwezayê wekî bîreser û amûr dinirxîne bê girtin. Rûxandina xwezayê ya ji ber nêzikbûna teknolojîyê û pêşketina sanayiye ya şarişaniya kapitalîst li ber çavan e. Li aliyê din ev nêzikatî bûye sedema pêşketîna bêkontrol a teknolojîya çek, nukleerî û genê ku di dawiyê de dikare bibe sedema bidawibûna mirovahiyê li gel tevahiya xwezayê. Ji ber vê sedemê niha civakên ku di wê ferqê de ne ji bo parastîna hevsgeniya ekolojîk û her wiha di qada pîvanên demokratîk de li rîyekê digere.
Hişmendiya mirovan li ser pêwiştiya jiyaneke civakî ya bi xwezayê re weke pêkhateyeke girîng a hebûna xwe ya xwezayî û sepanîna wê bi refartên çandî, derûnî û siyasî wê bibe girêka sereke ya çareseriya qeyrana ekolojîk û pirsgirêkên bingehîn ên mirovahiyê yên wekî xizani, birçîbûn, şer, îflîsmar û cudaxwaziye. Bi vî awayî dê rê li ber pirrengî, yekparebûn, yekbûna dinamik a cudahiyan û xweza û zindîwaran vebe ku bibe taybetmendiya xwezaya mirovî. Ji ber vê yekê, ji nû ve şekildana xwezaya civakî û berdewamkirina derfetên jiyana xwezayî û civakî bi destwerdana rast û bi bandor a mirovî li xwezayê, bi rêbazên aştiyane pêk tê.
Hevsengiya ekolojîk anax di hawîrdoreke demokratîk de ku mirov bi hev re di nava aştîyê de bin û bi xwezayê re jî di nava aştîyê de bin, pêş bikeve.

Qereçox, dijminên Şoreşa Rojava eşkere kir

Sînan Cûdî

Beriya 8 salan, di 25’ê Nîsana 2017’an de dewleta Tirk a dagirker, bi dehan balafiran, Çiyayê Qereçoxê bombebaran kiribû. Di encama vê êrişî de 20 hevtrêyên me ghiştibûn şehadetê. Hemwext dewleta dagirker çiyayê Şingalê jî bomberan kiribû.

